

PÊKENOK



Di dema razanê de yekî antênek danî ber
balîfa xwe. Hevalê wî pirsî:

– Ew antên ji bo çi ye?

Got: – Ji bo ku xewnên zelal bibînim!



Sibehekê jinekê mêrê xwe ji xew şiyar kir û got:

– Rabe rabe camêro, mişkek ketiye metbexê!

Mêrê wê bi hêrs gotê:

– Vêca ma ez pisîk im!

Zarokekî ji dapîra xwe re got: – Pîrê tu dikarî gûza bixwî?

– Wî ma ez qurban, diranê min nemane,
ez ê çawa bikaribim bixwim!

– Gelek baş e, a ji te re ev hinek gûzên min
bila li ba te bin, ez ê paşê werim bigrim!



Zarokekî ji zarokekî din re got:

– Çawa dibe, bavê te solfiroş e û tu bê sol î?

Zarokê din jî gotê:

– Ma çawa dibe ku babê te jî doktorê dirana
ye û tu bê diran î?